*Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê*
*Kurdistan National Congress*
***Congrès National du Kurdistan***
**کۆنگرەی نەتەوەیی کوردستان**

KNK

*Rue Jean Stas 41, 1060 Bruxelles Tel: 0032 2 647 30 84 Home Page:* www.kongrakurdistan.net *E-Mail:* kongrakurdistan@gmail.com

# بە دروشمی: بۆ کورد و کوردستان، پاراستنی زمانی کوردی ئەرکێکی نەتەوەیی یە! جەژنی زمانی کوردی پیرۆز بێت

١٥ ی گوڵان جەژنی زمانی کوردی یە، ئەمساڵ لە دۆخێکی ناهەموار و تایبەتدا ئەم جەژنە پیرۆز دەکەین. دەوڵەتانی داگیرکەری تورکیا، ئێران و سوریا ستەمکارانە هێرش دەکەنە سەر گەلەکەمان. بەم زۆڵم و زۆریەیان نەیانتوانیوە رێڕەو و ئیرادەی بەرخۆدان سست بکەن. کورد و کوردستانی بۆ بەدەستخستنی مافە رەواکانیان لە دژی ئەو دەوڵەتە داگیرکارانە خەبات و تێکۆشانی خۆیان بەردەوامی پێدەدەن.
گەلی کورد ساڵەهایە، لە پێناو بەردەوامی هەبوونی خۆی خەبات و تێکۆشانێکی مەزنی کردووە. لە میانەی ئەم تێکۆشانەدا سەنگەری زمان هەمووکات سەنگەرێکی ئاگرین بووە. هەر بۆیە داگیرکەران لەناوبردن و لاوازکردنی گەلی کوردی لە رێگای تواندنەوەی زمانەوە گرێداوە. لە پێناو ئەوەدا گرنگە کە کورد لە سەر پرسی زمان و پەروەردەکردن بە زمانی کوردی پێداگرن و خەباتێکی بێ وچانی بۆ بکەن.

زمانی ئێمە، ئەستێرەیەکی پڕشنگدارە لە ئاسمانی نیشتیمان. ئەگەر ئەم ئەستێرەیە بڕژێ و نەمێنێ، ئەوکات هیچ واتایەک بۆ هەبوونی کورد وەک نەتەوەیەک نامێنێ. بەوگیانە و لە رۆژگارە بەرتەنگەی ئەمڕۆدا بە رێ و رێبازە جۆراوجۆرەکانی پاراستنی زمانی کوردی پێویستە ئێمە جەژنی زمانی شیرینی کوردی پیرۆز بکەین و نەک تەنها ١٥ ی مانگ گوڵان، بەڵکو هەموو رۆژەکانی ساڵ لە هەر کات و ساتێکی ژیان کردن لەسەر ئەم خاکە پیرۆزەمان هەمیشە کات جەژنی زمانە. وشیاری و هۆشمەندیی کلتور و زمان لەناو گەل دا بەهێز بکەین.

پێویستە رێگا لەبەر دەم پەروەردە بە کوردی ئازاد و واڵا و پشتگیری بکرێت و بۆ ئەم مەبەستەیش لە سەرووی هەموویان حزب و هێزە سیاسیەکانی کوردستان و پاشان هەموو هاوڵاتیەکی کوردستانی خۆیان بە بەرپسیار ببینن و بە هەموو هێز توانابیەوە خەبات و تێکۆشانی زمانی کوردی مەزنتر و بەهێزتر بکەن.

کۆنگرەی نەتەوەیی کوردستان ک ن ک ە، لەم بوارەدا هەمووکاتێک سەرنجی هێزە نەتەوەیی و نیشتیمانیەکانی راکێشاوەتە بەر ئەم خەباتە و وەک پرسێکی ژیانیی بینیوە و کاری بۆ کردووە.
کۆمیسیۆنی زمان، کلتور و پەروەردەی ک ن ک ە، بەم بیردانک و هزر و باوەڕەوە دیسانەوە جەژنی زمانی کوردی بە دروشمی **بۆ کورد و کوردستان، پاراستنی زمانی کوردی ئەرکێکی نەتەوەیی و نیشتیمانی یە!** دەستپێدەکات.

**کۆمیسیۆنی زمان، کلتور و پەروەردەی ک ن ک ە**
**١٥ ی گوڵئن ٢٠٢١ - بروکسل**

Bi diruşma “ Ji bo Kurd û Kurdistanê, Parastina Zimanê Kurdî erkê neteweyî ye “
Cejna Zimanê Kurdî pîroz be

15 Gulanê Cejna Zimanê Kurdî ye. îsal di nav rewşeke taybet da ev cejin tê pîroz kirin . Dewletên Tirkîye, Iran
û Sûriya zulma xwe ya li ser neteweyê Kurdan sist nekiriye û naxwazin sist bikin, Kurd û Kurdistanî jî bona bi destxistina mafên xwe yên bingehîn li dijî van dewletên dagîrker berxwedana xwe didomînin.
Gelê Kurd bi salan e ji bo domandina hebûna xwe têkoşîneke xurt dide.
Di pêvajoya vê têkoşînê da çeperê zimanî her tim di serî da bûye.
Ji ber ku dagîrkeran têkbirin û helandina gelê Kurd bi birandina zimanê wan ve girêdaye, bona vê yekê giring e ku Kurd li ser pirsa perwerdeya Kurdî rawestin û
li ber xwe bidin
Zimanê me stêrka geş a
li asmanê welatê me ye, heke ev stêr birije û nemîne ti wate ji hebûna Kurdan re li ser vê erdnîgariyê jî namîne, bi vê ruhê û di van rojên teng da
bi rê û rêbazên cuda gereke em cejna zimanê şêrînê kurdî pîroz bikin û hişiyarî û hişmendîya çand û zimanî di nava gel de xurt bikin.
Pêwîste rê li ber perwerdeya bi Kurdî bê vekirin û ji bo vê yêkê di serî de partî û saziyên me û
di pey re jî her welatiyek Kurd gereke xwe berpirsiyar bibînin, bona vê armancê pêwîste Kurd li Kurdistanê bi hemû şiyanên xwe têkoşîna xwe xurtir û bilindtir bikin.
KNK
di vî warî da timî bala hêzên neteweyî kişandîye û dikêşê ser vê pirsa jîyanî. Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKê bi vê bîr û hizirê, pîrozbahîyên Cejna Zimanê Kurdî yên îsal bi diruşma "Ji bo Kurd û Kurdistanê Parastina Zimanê Kurdî erkê neteweyî ye" daye dest pê kirin.

**Komisyona Ziman, çand û Perwerdeyê ya KNKê**
**15 Gulan 2021, Bruksel**